

**zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin !**

# KULILK

**kurdiska elevernas barntidning**

**KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT**





HÊJE MÊJE

EMÊ NIHA ÇEND

ÇIROK Ü MESLAN

Jİ WE RE BÊJIN

Kulîlk

Sal: 1993

Xwendevanên hêja !

Em xebatkarên Kulîlkê sersala we bi dil-germî pîroz dikin û salek bi xweşî û dilgesî ji bo we dixwazin.

Bi vê munasebetê, em dîsa dixwazin hêvî û daxwaziyêñ xwe dubare bikin: Weke ku hun jî dizanin, gelek kovarêñ zarokan yên bi kurdî û tîpêñ latînî tune ne. Li gorî em dizanin, îro li tevaya dînyê hew yek tenê heye, ew jî Kulîlk e. Lê mixabin, Kulîlk jî bi awakî rîkûpêkî û di dema xwe de nayê weşandin. Ji bo Kulîlk bi awakî dewlementir, xweşiktir û rîkûpêktir derkeve, pêwîstiya wê bi alîkariyêñ we heye. Bi çîrok û serpêhatiyan, bi wêne û karîkaturan, bi kirîn û abonetiyê, divê hun Kulîlkê tenê nehêlin. Kulîlk bi alîkariyêñ we, wê bêtir geş bibe û bêhna xweş bigihêjine zarok û ciwanêñ kurdan.

Zarok û Ciwanêñ Kurdan !

Kulîlk, kovara we ye. Divê hun bi her awayî li wê xwedî derkevin. Kulîlk dikare bibe beşekî dengêñ we. Hun dikarin çîrok, metelok, serpêhatî, rojbûn, pîrozname, wêne û karîkaturêñ xwe ji me re bişînin. Jibîr nekin, ku biştgiriya we ya ji bona amadekirina Kulîlkê, wê kovara we zengîntir û spehîtir bike.

Li gel şandina nivîs, wêne û alîkariyêñ we yên maddî; pêşniyar û nerînen we yên di warê naverok, metod, û formê de jî, ji bo pêşdebirin û dewlemendkirina Kulîlkê xwedî cihekî zor girîng û taybetî ye.

Bi vê hêvî û bîrûbaweriyê, heta hejmareke din bimînin di xweşiyê de.

# GURÎ

Berhevkar: Bavê Hêvi

Gurî ji biçûkanî de, dê û bavê xwe wenda dike û sêwî dimîne. Ew dikeve ber destên ap û amojinê. Çi kar û barên giran hebûya, bi Gurî dihate kirin. Rojekê dilê wî pir diçe rûnê nîvişk. Dihere cem meşka rûn, hinek rûn li ser nanê xwe dike. Amojina pê dihise. Radihêle darçîtekî û bera dû Gurî dide.

Gurî ji wan dixeyide û sûnd dixwe, ku ew dê terka wan bike. Gurî dihere gundekî. Lê dinere ku govendek mezin geriyaye. Qîz û xorxetinin destên hevdu, toz û dûxanê bi ser serê xwe dixin. Pişti rawestandina def û zurnê, dest bi danîna xwarina dawetê dikan. Cifniyê mezin tije birinc û goştê berxa, dikşînin bin konê reş û mezin. Wek her kesî Gurî jî derbasî ser sıfıra hazır dibe û têra dilê xwe xwarinê dixwe. Ji xwe ev demeke dirêj bû ku Gurî xwarinek weha nexwaribû.

Hinek xorxen gund dinerin ku xorxekî biyanî û bi kum li ser sıfrê rûniştiye. Ew dixwazin hinekî heneka bi Gurî bikin. Gava ew xwarina xwe diqedînin, diherin cem Gurî û destên xwe bi kumê Gurî paqij dikan. Bi wî awayî, gelek kes destên xwe bi kumê Gurî pakij dikan.

Ber bi êvarê naxir dikeve nav gund. Çelekek ji nav naxirê di ber Gurî re derbas dibe, bîhna rûnê kumê Gurî tê çelekê. Çelek devê xwe davê kumê wî. Gurî bera dû çelekê dide, ku kumê xwe ji devê wê



derxîne. Çêlek berê xwe dide dewsbehêdera û Gurî dide dû. Ji bo ku bala Gurî li çêlekê ye, ew lê hay nabe ku çalek li pêşıya wî ye û di wê çalê de verdibe. Çal hinekî kûr e û ew bi serê xwe nikare ji çalê derkeve. Di dilê xwe de dibêje; "Çawa be dinya havîn û germ e. Ez dê işev di vê çalê de razêm."

Dibe êvar, tarî dikeve erdê. Bûka nû dixwaze derkeve destavê. Ji bo ku dinya tarî ye û ew gund nas nake, li çalê hay nabe û ew jî di wê çala ku Gurî tê werbûyî de, wer-

dibe. Herdu ji tirsa ne diwêrin bi hevdu re bipeyivin û ne jî gazî û alîkariyê bixwazin. Her yek li alîkî çalê rûdinin û diponijin.

Demek derbas dibe, bûk venagere malê. Xwediyê zavê wer bawer dikin ku bûka wan bi dû hineka ketiye. Gaziya gund bi dû bûkê dikeve. Her çend gundi bi hêlekê diçin û li bûkê digerin. Xortek jî fanosek di destâ de ye û dixwaze bighêje gaziyê. Gava tê dewsbênderan, dibîne ku Gurî û bûk di çalê de ne. Xort bi dengekî bilind gazî gundiyan dike:

- Wernê va ew li vir in. Xwedê ji wan re nehiştiye. Gava reviyanin, di çalê de werbûnin. Herku dihere însan li ser çalê pirtir dibin û her yek ji hêlekê bi keviran tê wan. Gurî û bûk dizanin ku çi bibêjin wê feyde neke û baweriya gundiyan wê bi wan neyê. Melê gund xwe dîghîne ser wan. Ji gundiyan re dibêje:

- Heyran, hela rawestin, em ifada wan bigrin.


Piştî gotinên Melê, bêhna Gurî hinekî tê ber wî. Piçek hêviya wî çêdibe ku êdî ew dê neyê kuştin. Gurî bi dengekî melûl ji serî heta dawiyê serpêhatiya xwe ji Mele re dibêje. Ji bo ku Gurî şiklê çêlekê jî ji gundiyan û Mele re dîbê; gundi nas dîkîn ku ew çêleka mala Mîsto ye. Mele ji xortekî re dîbêje:

-Zû bi lez herin çêleka mala Mîsto bînin vê derê. Xortek dihere çêlekê tîne. Çêlekê li wê derê şerjê dikin. Gava zikê çêlekê dîqelêşin, dibînin ku kumê Gurî di zîkê wê

de ye. Mele vedigere ser gundiyan û dîbê:

- De binerin! Tu nemabû me zilamekî bîyanî û bêguneh bîkuşta û qetla wî di sutuyê xwe xista.

Piştî gundi dibînin ku Gurî bêguneh e, li ber wî digerin. Rebenê Gurî xweziya xwe bi vî awayî jî tîne,



ku ew ji vê belaya mezin û nedîti weha bi erzani xelas bûye. Gurî ji bo çûyinê destûra xwe ji gundiyan dixwaze. Gundî çiqasî dikin û nakin, Gurî wê şevê li gund namîne. Ew ji nav gund derdikeve û dikeve ser rîyekê. Berî ku ew bighêje gundekî din,

xanîyekî dibîne. Gava dihere hundurê xanî, dibîne ku kadînek kayê ye û kes tê de tune ye. Peyvên rîsipîyan tê bîra wî, ku cihê germ û nava kayê ji birînêñ kevir û daran re gelekî baş e. Gurî bîryara xwe dide ku wê şevê li wê kadînê razê. Ew xwe dixe nava kayê û hew serê xwe ji derve dihêle.

Pir derbas nabe, jin û mîrek ku hevdu revandinin dikevin hundur wê kadînê. Ji bo ku hundur tarî ye, ew li Gurî hay nabin. Herdu li ser kayê li tenîsta Gurî rûdinin. Pişti bêhna xwe berdidin, keçik ji mîrik dipirse:

- Ka bibêjî, bê bi çi awayî dilê te kete min?

-Gava tu diçû ser kaniya gund, te kûzê avê dida ser milê xwe, şimika xwe bi erdê re dikişand û xwe bi nazikî dihejand, eşq û evina te dest pê kir, di dilê min de zîl da û roj bi roj bêtir şax veda.

Pişti bersîva xwe, vê carê jî mîrik ji keçikê pirsî:

- Baş e. Lê dilê te çawa kete min?

- Gava tu bekçiyê gund bû, darê te di destê te de bû, te bi darê zorê bac û bêş ji xelke distend...

Bekçi nehişt ku keçik peyva xwe biqedîne, perwaz da û bi pozbilindî got:

- Belê weha bû. Navê darê min "Lahdo" bû. Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim, min bi Lahdo weha li wan dixist. Bekçî bê ku li Gurî hay bibe, weke ku bi rastî bêşê ji gundiyan distîne, darê xwe li ser hev û bi hêrs li tenîsta xwe, li Gurî dixîne û dibêje:

- Ma qey yekî bigota ez bêşa xwe nadim,

**hema min radihişt lahdo û weha li wan dixist.**

Gurî ji bo çend darên pêşî deng nekir. Lê gava dît ku darê Bekçî rawestan lê tune ye, janê da dilê wî, hew debar kir û ji nişka ve got:

- Heyran bes li min xwe, ezê jî bêşa xwe bidim.

Bekçî û keçik ji tirsa bizdiyan. Nizanîbûn bê ci hatiye serê wan. Herdu bi bazdan ji kadînê direvin. Gava bi wê lez û bezê direvin, keçik buxçika xişil û zêrên xwe li dewsa xwe ji bîr dike.

Piştî reva wan, Gurî ji nav kayê derdikeve, radihêle buxçikê û bi kêt dibê:



**-Xwedê qismetê min anî ber destêن min.**  
Va ye min ceyizê xwe dît. Ya baş ew e, ez êdî ji xwe re qîzekê jî bibînim, bizewicim û ji ber destêن ap û amojnê derkevîm.

# BÊJHEYÊN NÛ

Li deftera xwe binivîse

guri .....
Ap .....
Amojin .....
dawet .....
govend .....
bûk .....
zave .....
dev .....
zurne .....
kon .....
kum .....
xort .....
naxir .....
bênder .....
gazî .....
bi dû ketin .....
li ber gerandin .....
fanos .....
mele .....
bêguneh .....
biyanî .....
xwezî .....
kadîn .....
ka .....
bac .....
bêş .....

---

# **SPARTIN**

## **Bêjeyên nû di hevokan de bi cih bikin**

---

- 1) Li gund ..... mezin geriya bû, qîz û xort ketibûn destêñ hevdu.
  - 2) Ji bo ku porê Ferho weşiyabû, ji wi re digotin.....
  - 3) Keçikê ..... da ser milê xwe û çû ser kaniyê.
  - 4) Piştînîvro ..... li hespê kirin û anîn mala.....
  - 5) .....gund gihaşt ser gaziya Gurî.
  - 6) Xortêñ gund destêñ xwe bi..... Gurî baqij kirin.
  - 7) Gavan ..... ji nav gund derxist.
  - 8) Dilêr bi cencerê .....xwe hûr dike.
  - 9) Hikûmet bi darêzorê .....û .....ji gundiyan distine.
  - 10) Koçer di ..... de dijîn.
  - 11) Em ji bo pez û dewaran .....dixin .....
- (bênder, ka, kum, gurî, kadın, bac, bêş, kon, bûk, zave, mele, kûz, garan, govend, naxir)

# BÊJE Ú HEVOK

Ji van bêjeyan hevokan çêbike

bariya pir baranek  
berînîvro

1) Berînivro baranek pir  
bariya.

dersa mamoto  
şagirtan dida

2) .....

bera xezalan dû  
dabû nêçirvan

3) .....

nan derew taştiya  
dew û

4) .....

bi berbanga em sibê  
derketin ji malê

5) .....

mala pînik e  
mirîşkan

6) .....

piştî ezê dibistanê bi  
bilîzim xwe hevalên  
re

7) .....


îro hat dereng dibis-  
tanê Dilşa

8) .....

bi ya pêwîst dê  
bavê û bikin em e  
xwe

10) .....

# MIJULİ



## HINEK REKORÊN DINYÊ

### 1) MEYDANA HERÎ MEZIN

Di dinyê de, meydana herî mezin li Çînê ye. Navê wê, Meydana Aşîtiyê ye. Di wê meydanê de, du milyon mirov dikarin bicivin. Mezinayıya Meydana Aşîtiyê 4000000 km<sup>2</sup> ye.

---

### 2) ZINGILÊ HERÎ MEZIN

Zingilê herî mezin yê dinyê, yê dêra Kremlînê ku li Moskovayê ye. Ew di sala 1733- an de, hatiye çêkirin. Giraniya wî zingilî 182 ton e . Bilindaya wî 6 m ye. Ji bo ku li zingil xîninin, divê 24 kes alîkariya hevdu bikin.

---

### 3) MIROVÊ HERÎ GIR Û GIRAN

Mirovê herî gir yê li dinyê, li Amerîka dijî. Navê wî Albert Jackson e. Albert di sala 1941- ê de hatiye dinyê. Gava hatiye dinyê, ew 9970 gram bûye. Niha giraniya wî 400 kîlo ye. Panbûna sînga wî 305 cm ye. Kursiyek erebê ya jî balafirê têra rûniştina wî nake. Siheta wî gelek baş e; lê ew nikare di binê wê giraniya xwe de bimeşe.


## **İmparatoriya Medya**

### **Lê bigere û fêr bibe**

- 1- Li ser nexşeyê gola Urmîyê, Akbatan, çiyayê Zagrosê û ba jarê Hemedanê bibîne û cihêwan nîşan bîke!
- 2-Li ferhengê binêre û maneyên van peyvan bibîne Ol, padişah, serbajar, nûjen, avteng, bere, dil, êriş, serhildan û serxwebûn.

İmparatoriya Medya, dewleta Kurdan a yekemin û ya herî mezin û berfireh bû. Heta îro yekemin car e, ku Kurd di nav dewletekê de hemû malbat, eşir û herêmên xwe kirine yek. Ji wêneyên li ser keviran dîyar e, ku seroketiya Medya ji gel û komikên curbe - cur pêk hati bû û serokatî kolektîv bû.

Dewleta Medya, B.Z. di dawiya sedsala 18-an de, di navbera gola Urmîyê, Akbatan û heta çiyayê Zagrosê berfireh bû. Hemedana îroyîn serbajarê Medan bû. Med cîranê Asûriyan bûn. B.Z. di navbera salê 745-727-an de padişahê Asûr yê bi nav û deng Tiglatpelayer, bi alîkariya Orarto û Xalidyan êrişekê dijwar dibir ser Medan. Wan, ji Medan bê hejmar kes kuşt û dîl girtin. Padişahê Medan Dîyako ji, di şer de hat kuştin. Lê, dîsa ji Med teslimê Asûriyan ne bûn û bi salan şer di navbera Med û Asûriyan de dom kir.



Piştî mirina bavê xwe, Keyxesro bû padîşahê Medan. Keyxesro, ji nû ve leşkerên xwe pêk anî. Hêzên siwarî û peya ji hevdu cuda kir. Li gor dema xwe metodêن şerê yên nûjen bi kar anîn. Ji tîravêjan komên êrîşkar çêkir. Wî, berî êrîşekê mezin û dijwar bir ser Eskîzîyan. Bi vê êrîşa han re, Keyxesro welatê Farisan jî xist bindestê xwe. İmparatoriya xwe mezin û fireh kir. Bajarê Akbatan avakir û ji xwe re kir serbajar.

Keyxesro, bi dewleta Babilon re têkilî danî. Ji bo êrîşbirina ser dewleta Asûr, bi dewleta Babil re peymanek çêkir. Ev car xwe ji şerê Asûriyan re baş amade kir. Keyxesro ji jor ve û serekdarê Babil Nebopolaser jî, ji jêr ve êrîşen dijwar û mezin birin ser dewleta Asûr. Berî Zayînî, di sala 612 -an de serbajarê Asûriyan Nînovayê digrin û dawiya dewleta Asûr tînin.

Ji wir û bi şûn ve Medan İmparatoriya xwe dîyar kir. Tixûbê İmparatoriya Medya, ji rojava ve digehîşt çemê Halis (Kızılırmak), ji bakur ve deryaya Qazwîn (Xezerê) û ji başûr ve jî digehîşt avtenga Îranê.

Berî Zayînî, di sala 550 yi de, padîşahê Babil Nebonîd û padîşahê Farîs Keyxesrew li hember

padîşahê Medan İstiyak bûn  
yek. Herduyan bi hevdu re,  
di bereyekî gelekî mezin û  
berfireh de , li hember  
İstîyak şer vekirin. Di daw-  
iya vî şerê dijwar û giran de,  
İmparatoriya Medya hil-  
weşandin.

Medî, ji bo serxwebûna  
xwe bê hejmar car li dij dij-  
min serhildan. Bi navê  
Medya Biçûk di herêmeke  
gelekî teng de man. Lê, bi ser  
ne ketin. B.Z. di sala 331 ê,  
di navbera İskenderê Mezin  
û Daryosê İranî de li nêzîkî  
bajarê Hewlêre şerek çêbû.  
İskender zora Daryosê İranî  
bir û dewleta wî xirab kir. Ji  
wir şûn ve, ev car Medî ke-  
tin bin desthilatdariya  
İskender.



*Ji dema Medan peykerê zêr,  
li Luristanê hatîye ditim*

## Ola Medan

Medî zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê Kurd û  
Iraniyan bû. Ew, B.Z. di 660 î de nêzîkî bajarê Urmîyê  
ji dayîk bûye. Medan ola wî qebûl kirin. Navê  
pirtûka Zerdeşt Zend Avêsta ye. Avêsta li ser çermê  
heywanan hatîye nivîsandin.

Di ola Zerdeşt de, du tiştên bingehîn û gîring hene:  
**Ronahî û tarî**. Ji ber vê yekê, di ola Zerdeşt de ronahî.  
xêr e. Jin e. Rastî ye. Roj û agir sembola ronahîyê ne.  
Şev, tarî, mirin, xapandin û durûti jî xerabî ne. Ji ber  
vê yekê, iro jî, di nav Kurdan de merdî, rastîti, paqîjî.

mêvantî gelekî edetên baş in. Roj û ronahî pîroz in. Kuştin, bêbextî, durûtî, şer tiştên ne baş in. Ev herdu



tişt her dem dijminên hevdu ne. Bingehê bîr û bawerîya Kurdên Yezdî ji ola Zerdeş tê. Lê, wan di ola Zerdeş de gelekî guhartin çekirine. Biderketin û belavbûna ola İslamê , Kurdan bi hêsayî ola İslamiyi qebul ne kîrin. Piştî ku dewletên cîranêni Kurdan ola İslamê qebûl kirin, Kurd ji di paşî de neçar man û

Zerdeş  
ola İslamiyi qebûl kirin. Piraniya Kurdan her çiqas ji hezar salan ve, dev ji ola Zerdeş berdabin û ola İslamê qebûl kiribin jî, lê iro jî, di nav Kurdan de gelekî prensîbên ola Zerdeş mane. Kurdên musilman hîn ji agir , roj û ronahîyê ji xwe re pîroz dibînin û bi wan sond dixwin. Di bingehê xwe de, cejna Newrozê jî, ji ola Zerdeş tê. Agirê Newrozê, azadî û ronahî ye. Aştî û serfirazî ye. Kawe sembola serhildanê ye.


### Bihizire û bersiv bide

- 1- Gelo sedemên serketin û têkçûna Medan ci bûn?
- 2- Ci cihêbûn û wekhevî, di navbera ola Zerdeş,  
Xiristianî û İslamiyi de hene?

(Ji Dîroka Kurd û Kurdistanê)

# MIJÜLİ

Du wêneyên weke hevdu bibîne



# PISİKA BÊXWEDÎ

Amdekar: pîro

Lezgîn ji dibistanê nû hatibû û hinekî birçî bibû. Ji xwarina do ya bi şev mabû, hinek xiste sêniyekê, perçak nan ji selika nêñ derxist û têr xwarina xwe xwar. Piştî xwarinê, ew derket derve û berê xwe da meydana gogê. Bi rê de, Lezgîn lê hay bû ku pisîkek li ser darê ye û dike miyaw- miyaw. Dar gelekî bilind bû û pisîk newêrîbû daketa jêr. Lezgîn hildikişê ser darê û pisîkê dadixîne jêr. Kêfa Lezgîn gelekî ji pisîkê re tê. Wî ji mêj ve dixwest ku pisîkek wî hebe. Lezgîn dev ji çûna meydana Futbolê berdide û bi kêf berê xwe dide malê. Gava digihije malê, bi dengekî bilind ba diya xwe dike:

-Yadê! Mizgîna min li te, min pisîkek gelek xweşik ji xwe re dît. Ez ji wê gelekî hez dikim. Tu dixwazî were lê binerî?

Diya Lezgîn hate cem wî, li pisîkê mêze kir û ji wî re got:

- Kurê min, te ev pisîk ji kû derê aniyî?
- Dayê, min ew ji ser darekê dît. Ew bi serê xwe nikarîbû daketa jêr. Min ji xwe re dîtiye. Loma jî, ew pisîka min e.

-Na kurê min! Ew ne pisîka te ye. Dibe ku xwediye pisîkê hebe. Gava em xwediye wê bibînin, pêwîst e, tu pisîkê bidî xwediye wê.

Rûyê Lezgîn hinekî tirş bû. Diya wî dizanîbû ku gotinên wê ne bi dilê Lezgîn bû. Lê pêwîst bû ya rast ci ye, ji kurê xwe re bigota. Destê xwe di serê



Lezgîn de da û bi dengekî nerm ji wî re got:

- Eger kesek li pisîkê xwedî dernekeve, wê gavê tu dikarî wê li malê bihêle. Ka rûyê xwe weha tirş neke û were diya xwe maçî bike.

Çendak derbas bû, kesekî li pisîkê nepirsî. Kêfa Lezgîn roj bi roj bêtir ji pisîka wî re dihat. Îlma xwe avêtibû ser wê û bê wê êdî sebra wî nedihat. Her-gava ji dibistanê dihat, berî her tiştî diçû li pisîka

xwe dinerî û hinekî bi wê re dilîst. Pisîk jî hînî wî bibû û gava ew didît, radipelikî wî, xwe di kincê wi de dida û weke ku dixwast diyar bike, bê çiqasî ji Lezgîn hez dike.

Ev kêt û xweşiya wan demek dirêj dom kir. Lê rojekê gava Lezgîn ji dibistanê hate malê, dît ku pîrekek û keçikek li ber deriyê hevşa wan in. Weke ku çel kes ji Lezgîn re bibêje, ku ew hatinin pisîka xwe bibin. Tirseke mezin kete dilê wî. Lezgîn hate cem wan, xêrhatin li wan kir û got:

- Fermo bibêjin! Hûn ci dixwazin?

Jinikê li Lezgîn mêze kir ku madê wî geleki nexweş bûye. Ji ruyê wî yê tirş û nexweş tê derxist ku Lezgîn bi hatina wan kêfxweş nebûye. Jinikê ji Lezgîn re got:

- Xortê delal, pisîka keçika min wenda bûye. Ev çendake ku em lê digerin, lê me ew li tu derê nedît. Dûre camêrekî ji me re got, ku te pisîkek dîtiye. Dibe ku ew pisîka me be. Em hatinin lê binerin.

Lezgîn bêdilê xwe da pêşîya wan. Gava ew ketin hundur, pisîk rapelikî Lezgîn û xwast dîsa bi wî re bilize. Jinikê û qîza xwe li pisikê mîze kirin. Lê ew ne pisîka wan bû. Lezgîn ji tirsa ku wê pisîka wî here, ruyê wî sipî- boz bûbû. Gotin bi devê wî nediket, mat mabû û li pisîkê dinerî. Bi dengê jinikê, Lezgîn weke ku ji xewn û xeyalekê şiyar bibe:

- Xortê delal, ev ne pisîka me ye. Pisîka me herdu rengên çavêن wê ne ji hev in. Di bin zikê wê ji nişanek reş heye. Gelek spas ji bo alîkariya te.

Piştî jinikê xatir ji Lezgîn xwest û ji malê derket; bêhna Lezgîn hinekî hate ber wî û ji nû ve bawer kir ku pisik dîsa ji wî re ma.

# BÊJEYÊN NÛ

Li deftera xwe binivîse

pisîk .....
hilkişandin .....
daxistin .....
jêr .....
xwarin .....
selîk .....
sêniîk .....
beros .....
mizgîn .....
rapelikandin .....
rûtîş .....
spas kirin .....
pêwîst .....
ji mêt ve .....
tîrsandin .....
bawer kirin .....
alîkarî .....
xort .....
qîz .....
domandin .....
nîsan .....

# **SPARTIN**

## **Bersiva pirsan bide**

**1) Lezgîn piştî xwarinê diçû kû derê?**

.....

**2) Lezgîn ji bo çi bi şûnde vege riya malê?**

.....

**3) Diya Lezgîn ji wî re çi got?**

.....

**4) Gava Lezgîn dihate malê, pisikê çi dikir?**

.....

**5) Ji bo çi jinik û qîza xwe hatibûn mala Lezgîn?**

# RENG

kurdî	fransizî	îngilîzî
spi	blanc	white
reş	noir	black
sor	rouge	red
zer	jaune	yellow
kesk, sewz	vert	green
şin	bleu	blue
qehweyî	marron	brown
qemer	basané	swarthy
qemerê vekiri, esmer	brun	dusky
gewr, spiyê girtî	clair, gris clair	light, light grey
qerqaş, çil spi	blanc éclatant	bright white
binevşî, mor	violet	purple
pembe	rose	pink
erxewan	pourpre	crimson
kej	blond	blond, fair
bor	roux	red-haired, redhead
boz	gris-pommelé	dapple-grey
çûr	jaune clair	light yellow
qiçık	jaune paille	straw colour
qer	noir brillant	bright black
şê (qehweyê bi sorayîve)	alezan	chestnut
genimi	couleur de blé	wheat colour
şiri	opalin, laiteux	opaline
xakî	kaki	khaki

(jl Kurmancî)


## QUNCİKA MATEMATİKÊ

- 1) Hevjîn dixwaze diyariyekê ji xuşka xwe re bikire. 120 lîrayên wê hene. Bêyî diyariya xuşka xwe, divê pirtukekê ji xwe re bikire. Pirtûk bi 87 lîra ye. Diyariya ku dixwaze bikere jî 145 lîra ye. Gelo çend lîrayên din ji Hevjînê re pêwîst in, ku ew pê pirtûka xwe û diyariya xuşka xwe bikire?
- 2) Sê odayê malekê hene. Odeya herî dirêj 12 m. ye. Ya navîn ji ya herî kin 2,5 m. dirêjtir e. Odeya herî kin 8,5 m. ye. Gelo dirêjayiya odeya navîn çend metre ye?
- 3) Serdar dihere sûkê. Ew 3 kg. bacan, 2 kg firingî, 1,5 kg goşt, 5 kg pîvaz û 2 mirîşkan dikire. Kîloya bacana bi 12 lîra ye, ya firingiya bi 8 lîra, ya goşt bi 35 lîra, ya pîvaza bi 2 lîra û yeka mirîşka jî, bi 25 lîra ye.  
Gelo Serdar çend lîreyan dide dikandae?
- 4) Bejna Xezalê ji ya Newalê 5 cm. dirêjtir e. Ya Binefşê jî, ji ya Xezalê 6 cm. kintir e. Bejna Newalê 168 cm. ye. Gelo bejna Xezalê û Binefşê çend cm. ne?


# MEYWE

kurdî	tirkî	fransizi	ingilizi
sêv	elma	pomme	apple
porteqal	portakal	orange	orange
hurmê	armut	poire	pear
bêjir	incir	figue	fig
hinar	nar	grenade	pomegranate
zêbeş, şuti	karpuz	pastèque	watermelon
xox	şeftali	pêche	peach
tiri	üzüm	raisin	grapes
kelek, gundor, petêx			
qawin, qire	kavun	melon	melon
arûng, zerdeke			
qeysi, müşmis	kayısı	abricot	apricot
tütfrengî	çilek	fraise	strawberry
tû	dut	mûre	blackberry
behiv	badem	amande	almond
göz	cevîz	noix	walnut
gélaz, qeresi	kıraz	cense	cherry
wigne	vîgne	gniotte	morello cherry
biyok, bîh	ayva	coing	quince
alüçe	yeşil erik	mirabelle	plum
incas, tulûreg	kara erik	prune	plum
limon	limon	citron	lemon
mûz	muz	banane	banana
mandarin,	mandalîn	mandarine.	mandarin.
klemantin		clémentine	clementine
fistiq, piste	fıstık	pistache	pistachio
findiq, bîndeq	findik	noisette	hazelnut
bitim	bitum		
kezwan, şinok	menengüç		
givij	akdiken	aubépine	hawthorn
xurme, qesp	hurma	datte	date
hembelaz, xatûnok			
dendüreşk	bögürtlen	mûre sauvage	bramble
ananas	ananas	ananas	pine apple
şekok, girsik			
tîhok, tawik	dağdağan		
belüt	palamut	giand	acorn
kestane	kestane	chataigne	chestnut
tereqî	nektarin	nectarine	nectarin
zeytün	zeytin	olive	olive
			(ji Kurmancî)

## Hejmaran yeko- yeko bighînin hevdu



# XƏÇEPIRS



# PÊZANÎN

1)

Tişkî min heye bê ruh e, lê dimeşe.  
Ew çi ye?

Bersîv: .....

2)

Hildikşim ser zinarekî  
Lêdixim, deng diçe hezarekî  
Ew çi ye?

Bersîv: .....

3)

Kerî kete ser stérkan  
Ew çi ye?


Bersîv: .....

4)




Tişkî min heye  
Mehê carekê kal dibe  
Dimre û dîsa dizê  
Ew çi ye?

Bersîv: .....

## BERSIVA XACEPIRSAN



2	K	İ	R	O	S	K
1	U		O		Ê	
	V		V			R
5	G	A	R	I	S	
	R					
6	K	E	W			



## **BERSİVA PÊZANÎNA (46)**

**1)**

**Tişkî min heye tiştanî  
Ber kevirê xiştanî  
Ne pê ye, ne panî  
Ew çi ye?**

Bersiv: mar

**2)**

**Tişkî min heye  
Dikşe, ne mar e  
Dimike, ne kar e  
Pişt kovik e, sîng dar e  
Ew çi ye?**

Bersiv: kîso, kûsî

**3)**

**Tişkî min heye  
Canê wî goşt e  
Kincê wî derzî  
Ew çi ye?**

Bersiv: jîjo, jûjî

KEREKÎ ME HEBÛ  
Û KUNDUREKÎ ME  
KERÊ ME KUNDURÊ  
ME KOT, KOT, KOT  
ME JÎ ÇIROK Û  
MESELÊN XWE YÊN  
VÊ HEJMARE  
JI WE RE GOT

Kulilk

Sal: 1993

www.arsivakurd.org

**ADRES - NAVNİŞAN  
Box: 70 31  
164 07 KISTA - SWEDEN**

**POSTGIRONR: 98 66 50 - 0**

**PRIS - BIHA : 15:- skr**

**UTGIVARE  
Kurdistans Arbetar- Kultur Förening**

**WEŞANÊN KOÇ – KAK  
Komela Çanda Karkerên Kurdistanê**

**REDAKTOR  
Zinar Soran**